# DENG

Hijmar: 97 û 98 – meh: Êlûn û Çireya yekem- sal 2008z, 2620k

( Demoqratî ji welêt re, û venasîna bi heyîna milletê kurd wek netewa duwem di destûrê welatî de )

*Rojnameyeke giştî ye, ji weşanên nivîsgeha çand û ragihandinê, ya pariyta Azadî ya Kurd li Sûriyê*




## .. SERNIVÎS ..

### BARÛDOXÊ NAVDEWLETÎ .. XWENDINNE NEWEKYEK

**P**êşkevtlnên ramyarî yên dawîn û encamên wan ji livên diplomasî yên bi lez û danîna gellek rêkxistinan .. nîşaneyê didine adgarên qonaxeke nû , asone fireh ji karliyekkirin û pêwendiyê hildigire. Lê xwendinne newekyek he ne ji rêbarê barûdoxê ramyarî re, nemaze di layê navdewletî de û bandora wî li ser layên din ên herêmî û navxweyî ..

Hinek dibînin ku rola amerîkî dest bi qelsbûnê dike, û cemseriya tenhayî bi ser avabûnê de xwardibe, û ketwarê ramyarî di melbendên navdewletî de sirûştiya diyarbûna firecemseriyê

**Dûmahî .. R : 2**

## BERÊ BÛYERAN .. Û ERKÊN ME??

**Rewşa** polîtîkî di devera rojhelata naverast de berve aloziyê de diçe tevî hindek çareyên katî li Libnanê û Îraqê, ji ber rola nû ya Rûssiyayê û Fransayê û bandora vê rolê li ser karê ku dibû ji bo temamkirina kiryara guhertina demoqratî û lêdana li bingehên zor û stem terorîzmê, û avakirina bingehek ramyarî, û zewîneyek demoqrat ji rijêma polîtîkî ya tê re ji bo vê devera ku gellek ziyan dît ji stem û regezperestî û lipaşmana civakî.

Ango ev rewşa di astengiyê de ye û dê wek xwe bimîne heya demek ne dirêj ,

**Dûmahî .. R : 7**

## JI BO VEJÎNA MEHRECANA HELBESTA KURDÎ YA / 13 / LI SÛRYAYÊ

- **Komîta** amadekar ya mehrecana helbesta kurdî di roja- /16/5/2008/ an de civînek li darxist.

Di destpêkê de xulekek bêdeng rawestiya, li ser Giyanê Şehîdên kurd û Kurdistan, li ser giyanê Şehîdên peyva azad, û li ser giyanê helbestvanê Nemir Xemgînê Xanê…

Her wisa civîn li ser çend mijaran rawestiya û çend xal destnîşan kirin.

- di roja / 21 / 6 / 2008 /.an de civîna diwemîn li darxist. Û piştî giftûgoyek berpirsiyar, ev xal û biryarên jêrîn hetin dûpat kirin:

**Dûmahî .. R : 4**

## KOMÎTA XELATA OSMAN SEBRÎ Dr. MUNZIR EL-FEDIL XELATDIKE

***Di*** sala 1998ê de hin nivîskar û ronakbîrên Kurd li Rojavayê Kurdistanê "**komîta xelata Osman Sebrî ji bo dostaniya gelan**" li Şamê damezrandin. Komîta xelatê, biryar dabû ku dê her sê salan carekê dostekî ji dostên gelê Kurd xelat bike, da rêzdariya xwe û ya gelê Kurd ji bo helwestên berevanî û berhemên dostên gelê Kurd biderbirîne.

Li gor vê erkê , komîta xelatê , di sala 2000î de xelata xwe ya

**Dûmahî .. R : 5**

**Sernivîs .. Dûmahî**

dide, çi ramyarî be an aborî be, nemaze vegera rola Rûssiya û Çînê û desthijandina wan bi mafê VETO di encûmena asayişê de ji hindek mijarên germ re.. û nahe veşartin – di niherîna wan de – hevrikiya aborî di navbêna dirg û kombûn û kompaniyên aborî yên amerîkî û ewropî û japonî û çînî .. de, tiştê ku – di nerîna wan de – rola amerîkî sinûrdike û pişkdariyê dike di dirêjkirin û xurtkirina rola cemserên din de û nemaze yê ewropî. Û ziyatirî vê yekê, xwediyên vê nerînê dibêjin ku rêkxistinên dawîn li deverê û cîhanê, lihevkirina Dewhayê sebaret bi Libnanê, alûgorên sûrî – îsrayilî di riya berevanê turk re, û kedên ji bo nûjenkirina rewşa felestînî, nehatina Sûdanê li dûv biryarên dadxwazê giştî di dadgeha gunehkariyê ya navdewletî de, û kodetaya serbazî li Morîtanyayê, û vekirina nivîsîngehne Îranê di giravên îmaratî de, û ketina Rûssiya di Gurcistanê de, û liva her sê dewletan (Sûriya – Turkiya – Îran) ji nû de û berdewamkirina hevdîtin û rêkxistinên wan ên hevbeş ji bo rawestina li dijî rewşa kurdî bi gelemperî an destêwerdana di îşê Îraqê de bi taybetî.. ev hemî – di nerîna wan de – encamne sirûştî ne ji barê navdewletî yê guhertî re.

Di layê din de jî, he ne yên dibînin ku Rûssiyaya federal ne Yekîtiya Sovyeta berê ye, çimkî ew dewletek sermayedar e û şiyanên wê yên serbazî yên fireh he ne, û ew tê hijmartin ji dewletên pîşesaz ên mezin, lê ew îroj mijûl e bi berjewendiyên xwe yên aborî de û şiyana wê tunne ye ji bo yarmetiya dewlet an rijêm an gelên din, an ji bo bikeve tekoşînne tûj an hevrikiyê bike li ser cemseriyê bi dewletên pîşesaz ên bihtir pêşkevtî re, çimkî ew xemxur e – di hewildanên xwe de – ji bo vegerandina rola xwe ya pêşeng di nav rijêm û gelên jê veqetiyayî de bi taybetî ji bo qerebûkirina ziyanên xwe yên ji tiştê bûyî hatine der. Û wilo sebaret bi Çînê jî, rast e ku ew ji dewletên mezin ên xwedî giraniya polîtîkî û serbazî û aborî jî ye, lê – di ketwarî de – wê pirr ji rahatina xwe ya aydyolojî (wek dewletek sosyalîst – komonîst) guhertiye bi şêwene ku karliyekdibin di gel barê navdewletî yê nû.. çiku dest berdaye ji nexşedanana navend di aborê de û dirêjiyek ji veguheztina lîbral daye wê û hevrikiya aborî xistiye şûna leşkerkirina tekoşîna polîtîkî û aorî, û bi xurtî ketiye bazarên cîhanî piştî ku bihtir guh daye cure û pêşkevtina berhemê. Û sebaret bi dewletên ewropî û Japonê û Kenedayê jî ev laya dibûne ku ew hîn başiya têkeliyên xwe bi Yekîtiya Wilayetên Amerîkî re diparêze di riya hevbendiyên leşkerî û polîtîkî re yên rol û payeyê ya dawîn (Amerîka) xurt dike, ango ew berdewam e di rola xwe de û hîn alavên jêrdestkirinê û tek cemseriyê di dest de ne di warê jêrdestkirina xwe ya polîtîkî û aborî û pêşengiya leşkerî de. Û heger hindek ji qelsbûnê xuyankiribe di liva wê ya polîtîkî an diplomasî de , ew vedigere mijûlbûna wê ya ziyatir bi rewşa hindur de û nêzikbûna sozê hilbijartinên seroketiyê.

Ya rast jî, tiştê di layê yekemîn de tê gotin dernakeve ji biwarê çandeya dema berî guhertina ku li cîhanê dibe, çandeya cûnbûnê û tekoşîna aydyolojî, û ji xwediyên vî rexî re xweş e vegera cûnbûnên polîtîkî û leşkerî weku herdu bendên Warso û û Etlesî.. li kêleka desteyên polîtîkî yên din, ji bo kaşkirina her rexekî ber bi xwe de ji rijêm û dewletên xwedî berjewendî û armancên hevbeş. Û guman nîn e ku layê din jî bilindpêjiyê dike di jêrdestkirina yek layî û berve yek cemseriyê û pragmatiya têkeliyên polîtîkî de xardibe, û berjewendiyên aborî ji xwe re dike armanca tek ji bo zalgeyê bide ser jêderên dahatên aborî û merivî, tiştê ku dixwaze gellek rastiyên pêwîst veşêre, û ziyanê bigihîne rola hêzên navdewletî yên kirdar û pêwîstiya guhertina berdewam jî kêm bike, û di herdu layan de jî çewaşebûnek tenê heye tevî ku bi rêjene newekhev be, ji biewarê rastiya guhertina ku li cîhanê diqewime berve jiyaneke ramyarî nû de.

Tiştê ku li cîhanê dibe ne vala ye ji hevrikiya aborî û hevbirkiya polîtîkî, lê dimîne di komeleyekê de ji têkelî û yasane ji azadiyê û demoqrasiyê, dûrî hişmendiya şer û tekoşînê nemaze di nêvana her heşt dewletên pîşesaz ên mezin de ku bi gêreyî hevdîtin û civînên wan hene, çimkî ew digihêjine hevûdu di rêkeftineke pêşkevtî de li ser bingeh û prensîpne bellî û

**Dûmahî .. R : 3**

**Sernivîs .. Dûmahî**

bernamekirî ên sazdikin ji projeyek cîhanî re ji bo guhertinê û veguheztina demoqrat bi armanca rizgarkirina merivî – kî dibe: kes bin an millet bin.. – ji stem û zorê, û jinavbirina terorîzmê û çekên wêrankirina giştî û her tiştê zorê dide nîgeraniya merivî û tenahî û seqamgêriya wî, û pêkanîna alavên vewjandina aborî û pêşkevtina ramyarî û pêşveçûna civakî di riya rêkxistineke nû di cugrafiya polîtîkî de ji gellek dever û herêman re, di riya pêşkêşkirina mezintirîn projeyan re (wek projeya rojhelata naverast a nû) û avakirina yekîtiyên herêmî û bejekî ..h.d.

Ji vir de , em dikarin encamgêriyê bikin ku rêkxistinên li hemî deveran dibin - û jê devera me – dernakevin ji bazineyê rêkeftina komelgeyî ya navdewletî ger bi çi rengî be û bi taybetî her heşt dewletên pîşesaz ên mezin û dûmahiya dewletên yekîtiya Ewropî, tevî ku rola hindekan xuya bibe di vî biwarî an yê din de û di vê dozê an ya din de û li gorî rêkeftina berjewendiyan û armancên nêzîk jê û yên dûr. Ango tiştê bûyî di çend mehên borî de di derheqê rêkxistinên devera me di riya Parîsê û Enqerê û Dewhayê re, û tiştê ku dibin li dever û herêmên din li cîhanê, an ne dûr in ji cemserên komelgeha navdewletî û nemaze Yekîtiya welatên Amerîkî ya ku rola wê pêwîsttir e di siyaseta navdewletî de, an jî dê bisernekeve tevî ku demeke kurt berdewam bike, an jî cureyek heye ji lihevbelavkirina rolan di nêvana wan de ji bo dorpêçkirina astengiyan heya ku alavên dermankirinê û temamkirina mercên serkeftinê jê re têne dîtin. Ev jî bellî bû di gellek doz û kêşe û pirsgirêkên xwedî guhdana hevbeş a navdewletî de, û jê nameyên amerîkî ji Sûriyê û Îranê re di riya Parîsê û Enqerê re, di gel pêwendiya rastexwe di nêvana Parîsê û Waşingtunê de di derheqê hemî rêkxistinan de û bi taybetî kiryara aşitiyê û rewşa libnanî û ya îraqî, ango ti guhertinî gewherî nîne di siyaseta navdewletî de û ti qelsbûn nîne ji rola ti layên bingehîn re ji fêdeya yên din re, lê qonaxek tenahî ya navdewletî rêjeyî heye dibe ku bikeve pêşiya xafletîne bendewar.

## Ferhengoka sernivîsê:

Adgar - ملامح
Asayiş - أمن
Alûgor - مفاوضات
Alav – عامل، سبب
Biwar - مجال
Berjewendî - مصلحة
Berevan - وسيط
Bilindpêjî - مغالاة
Barûdox - وضع
Bandor - تأثير
Bejekî - قاري
Cure - نوع
Cûnbûn - تكتل
Cemser - قطب
Çewaşebûn - التباس
Çande - ثقافة
Dorpêçkirin - محاصرة
Dadxwaz - مدعي
Dirg - كتلة
Destêwerdan - تدخل
Desthijandin - تلويح
Dahat - موارد
Encûmen - مجلس
Encamgêrî - استنتاج
Girav - جزيرة
Hevrikî - تنافس
Hevbirkî - تباري
Jêder - مصادر، مكامن
Jinavbirin - مكافحة
Jêrdestkirin - هيمنة
Ketwar - واقع
Karliyekkirin - تفاعل
Kirdar - فاعل
Komele – منظومة، جمعية
Kodeta - انقلاب
Komelge - مجتمع
Kiryar - عملية
Lihevkirin - اتفاق
Merc - شرط
Melbend - مركز
Nûjenkirin - ترميم
Newekyek – مختلف، متباين
Nexşedanan - تخطيط
Nîgeranî - قلق
Pêwendî – علاقة، ترابط
Pîşesaz - صناعي
Prensîp - مبادئ
paye - مكانة
Pêşeng – طليعي، رائد
Qerebûkirin - تعويض
Rol - دور
Rêje - نسبة
Rahatin - ممارسة
Ramyarî - سياسي
Rex - اتجاه
Rêkxistin – ترتيب، تنظيم
Rêbar - مسار
Serbazî - عسكري
Seqamgêrî - استقرار
Sermayedar - رأسمالي
Şiyan – قدرة، إمكانية
Şêwe - أسلوب
Tenahî - هدوء
Vewjandin - تنمية
Xemxur – معني، مهتم
Yarmetî - مساعدة
Ziyan - ضرر
Zalge - سيطرة

**D E N G**

**JI BO VEJÎNA MEHRECANA**

1- Çapkirina berhemên pêşkêşbûyî di mehrecana- /12/ an de, di pertûkekê de.
2- Çêkirina sê xelatan ji Mehrecana /13/ an re,
- Xelatek şehnazî.
- Du xelat ji bo çaktirîn helbest. (ya nûjen û ya kêşesaz)
3- Bijartina komîtek serbixwe, kawir û rexneyî ji bo Nirxandin û bijirtina çaktirîn helbest di Mehrecana /13/ an de.
4- Kar ji bo berdewamkirina têkiliyên şaristanî bi hemî helbestvanan re.
5- wergirtina helbestan yan dest bi deste û yan li ser îmêla komîta mehrecanê ye ( mehrecan13@gmail.com ) (mehrecan13@hotmail.com)
6- roja dawî bo wergirtina helbestan /15/9/2008/an e.
-Komîta amadekar hewildide ku pêkanîna van biryaran bi çakbînî bi şopîne û çalakiyan berdewam bike da ku em mûma xwe ya/13/an bi hest û raman, bi sawêr û xewnên Helbestvanan ronî bikin..

Em hêvîdar in ku rewşenbîr û helbestvanên me karekî hevbeş bi asteke bilind, û coşeke germ bi erkê xweyî wêjeyî, nîhadî û netewî li derbarî çanda xwe xwedî derkevin û têr wate bikin…

**Têbînî:**

Komîta amadekar ew biryara ku derbarî çapkirina helbestên pêşkêşbûyî di mehrecana / 12 / an de standibû bi cî kir û niha pertûk bi navnîşana Helbestên Mehrecana / 12 / li nav helbestvan û nivîserên kurd belav dibe.

Di roja 22 / 8 / 2008 an de komîta amadekar civatek dî lidarxist di heman vê civatê de komîta nirxandinê jî tevlî civînê bû ku ji layî komîta amadekar hatiye hilbijartin, û herdu komîtan danûstandinek baş û berfireh li ser gelek tiştên pêwîst derbarî mehrecanê bi hev re kirin, û dîs hemî biryarên jorîn hatin tekezkirin.

Komîta amadekar ya Mehrecana Helbesta Kurdî a /13 / li Sûryayê.
( mehrecan13@gmail.com )

# STRANEKE CÎNGANEYÎ

**АЛексанДр БЛок ( Alêksandir Blok )**
**<u>Wergerandin Ji Erebî Bo Kurdî</u> :**
**Fadil Temo**

Rûgeştirînê hemiyan ez bûm
Dilsoztirîn , û keşxetirîn
Tika dikim ji te
Ku tu nifiran
Li min nekî
Wek straneke cînganeyî
Difire tirêna min
Wek ew rojên , ku venagerin
Û li paş min dimîne
Herçiyê ku min hez jê kirî
Û li pêş min
Nenase rê
Pîroz be çiyê ku çûyî
Pîroz be .. nemire
Û ûmîda vegerê tineye
De , li min negire ..

Û sal li pê salan çûn
Û îşev
Di xewnê de
Nişkav de min dît
Ku wê
Qe ji min hez nedikir
De , ta niha
Li ku bûn çavên te sersamo ??!
Min di xewnê de dît
Ku lêrasthatin bû hevdîtina me
Lê rast hat
Ku min ew di rê de dît
Paşê
Bêrîkirina wê ya keçikî
Sar bû
Ji min re sar bû
Got: (( min bibûre .. oxir be ))
Lê dilê min
Hîn bi evîna wê
Lêdide , û
Kêlîkên ku ez
Ne bi wê re derbas dikim
Jehrin .. jehrin .
------------------------------
***Şanek:*** *Danîna sernava vê deqê ji alî wergêr de ye.*

**Komîta xelata Osman Sebrî .. Dûmahî**

yekemîn pêşkêşî zanyarê Turk, civaknasê navdar **Prof. .Îsmaîl Bêşekcî** kir, û xelat li Anqerê gihande destên wî. Di xola duhem sala 2004ê de, xanima Firnasa ya yekemîn **Danyal Mîteran**, ya ku bi navê" **Dayika Kurdan** " jî hatiye nasîn , li Parîsê hate xelatkirin.

Dîsan komîta xelatê vê cara sehem dostekî ji nav dostên gelê Kurd vedibjêre, û rûmeta wî bilind dinerxîne, ew jî kesayetiyeke îraqî ye, ku di nav akadîmiyan û siyasetmedarên Kurd, Ereb, îraqî û navdewletî de bi helwestên xwe yên erênî û rûmetdar li beramberî gelê Kurd pir gernas û nasdar e.

Ev kesayetiya rêzdar **Dr. Munzêr El-Fedil** e. Ew kesayetiyeke Ereb e û ji Îraqê ye, li bajarê Necefê ji dayikê bûye . Weke tête zanîn jî, bajarê Necefê bi gelek nivîskar, helbestvan û siyasetmedarên xwe navdar e. Şêxê helbestvanên Ereb Muhemed Mihdî El-Cewahirî jî ji bajarê Necefê bû, ewî dastaneke helbestî pir nirxbuha ji zû de terxandibû Kurdistanê, gelê Kurd û serokê nemir Mile Mistefa Barzanî. Neweyên Kurd herdem wê dastanê dixûnin û xwe pê şenaz dibînin .

Rêzdar Dr. Munzêr El-Fedil li zanîgehên Bexdê, Muite, E'mman, Zeytûn(Urdinê ) , Selah El-Dîn li Hewlêrê û kolêga yasayê li Londinê mamosteyatî kiriye. Herweha jî ewî di navbera salên 1989 –2004ê de serpereştiya gelek belgenameyên mastir û doktorayê kiriye.

Dr.Munzêr El-Fedil ji sala 1991ê de bi partî û rêxistinên dijberî rêcîma Sedam Husên re têkoşîn dikir, ew di çarçewa mafên mirovan de xebitiye û dixebite. Her dîsan jî; ewî piştevaniya pirojeya dadgeha navdewletî ji bo dadgehkirina tawanbarên îraqî bi serdariya Sedam Husên , yên ku li dijî Kurd, Şîe û dewletên dirawasê şerkirine, kiriye .

Dr. Munzêr El - Fedil li gelek kongirên cîhanî beşdar bûye , mîna li van dewletan ; ( Emerîka , Siwêd , Holenda , Nirwêc , Birêtaniya , polin , Danîmark , Almaniya , Firansa û li herêma Kurdistanê , di wan civat û kongiran de li ser doza gelê Kurd û Kurdistanê , dêmokratiyê , mafên mirovan , mafên jinan û destlatdariya yasayê , mafê azadiya derbirînê û dadgehkirina tawanbarên îraqî axiftiye , û lêkolîn pêşkêş kirine .

Rola Dr. Munzêr El-Fedil di piştgiriya gelê Kurd de ji bo mafê çarenûsiyê pir berçav e, ew ji nav Ereban ji kesên pêşî ne ku berevaniya damezrandina dewleteke kurdî serbixwe dike. Lewre jî, ewî di sala 2005ê de cihê xwe di vîtka hevbendiya Kurdistanî de girtbû, û li ser navê vê vîtkê mîna endamê komela niştimanî(Perlemana Îraqê) hate hilbijartin. Herwisa jî ew weke endamê komîta amedekirina destûra Îraqê jî hatiye hilbijartin. Bi ser de jî kongira netewî ya kurdî li Emerîka sala 2005ê ew mîna endamekî rûmetdar li nik xwe pejirandiye.

Dr. Munzêr El-Fedil pir gotar, lêkolîn li ser mafê gelê Kurd, Enfal, Helebçe û li ser hin navçeyên din yên kurdistanê bi zimanên erebî, kurdî, îngêlîzî, siwêdî, polonî weşandine, û sala 2004ê pirtûka xwe ya giranbuha " Lêkolîn li ser kêşa kurdî û pêşeroja Îraqê" bi zimanê erebî li Siwêdê weşandiye, û careke din ev pirtûk sala 2005ê li Kurdistanê hatiye çapkirin, û xelata serokwezîrên herêma Kurdistanê wergirtiye . Herweha ewî pirtûkeke din jî bi sernavê "Ji enfal de ta serxwebûnê, miletek dîrokê ava dike" dîsan bi zimanê erebî di sala 2005ê de weşandiye.

"Komîta Xelata Osman Sebrî ji bo dostaniya gelan" bawer dike ku ewê dîsan kanîbû kesayetiyek bash û hêja ji nav dostên gelê Kurd vebjêre û" Xelata Osman Sebrî" pêşkêşî wî bike.Her weha komîte dixweze bêje ku dê herdem ji dostên gelê Kurd û ji bîranîna koçkirina têkoşer û wêjevanê Kurd Osman Sebrî re dilsoz bimîne.

Hêjayî gotinê ye em bidin xuyakirin, ku rêwresmên xelatkirina Dr . Munzêr El-Fedil dê, ji bo mijûliyên wî, sala 2009ê li Elmaniya pêk bên, û dem û cihê wan dê wê hîngê bêne diyarkirin û ragihandin.

**Elmaniya 28. 09. 2008**

**Komîta xelata Osman Sebrî**
**ji bo dostaniya gelan**

# KERKÛK PAŞEROJA PÊWENDIYÊN KURD Û EREBAN ...?!

***Zagros***

Gelek caran rûdanek yan pêşhatinek bi ser milletekî de têt , dibê ew pêşhat bi şêweyekî ne pêşbînkiri kartêkirinek yekcar zor li bîr û boçûnên wî milletî bike û dibê ew rûdan paşeroja wî milletî destnîşan bike, û dîroka milletê kurd xuyadikê ku dema milletê kurd bîr û boçûnên xwe yên ayinî yên zeredeştî guhertîn û bawerî bi musilmantiyê anîn bi rengekî yek carî kartêkirinên nerînî li dîrok û paşeroja gelê kurd kir .

Yekek ji tabetmendiyên mirovê kurd yên derûnî bi dirêjiya mîjoyê bawerîya wî bi piransîpên pêkvejiyanê û lêborînê û bawerî û mitmane bi xelkekî dîtir û gelek caran ev bîr û bawerî bûne hokar û sedemên şikestina miletê kurd?!

Pirsyar di vir deye aye: kerkûk dê kartêkirinê bikê li van bîr û boçûnan yan na…….?

Weku em dizanin ku kekûk xaleke serekî bu di danustandinên serkidayetiya şoreşa kurdî di gel rijêmên pêştir yên Îraqê û nakokî li ser kerkûkê bû sedemê helweşandina rêkeftina 11 adarê û her kerkûk bû sedemê dûbarekirina şerê çekdarî li başûrê kurdistanê û ji ber evê milmilanê di navbera serkirdayetîya kurdî û rijêmên îraqî û di encam de miletê kurd tûşî ziyanek mezin bû ji enfal û kîmya baran û komelkujî….

Û piştî azadkirina îraqê ji rijêma diktatorî carek dîtir kerkûk û şingal û xaniqîn bûn cihê milmilanê di navbera hikûmeta herêma kurdistan û hikûmetên îraqî de ………..

Bi hewl û koşeşek zor made 140 hate pesindkirin di destûra hemeşeyî ya îraqê de û bûye birgeke destûrî ku bi rêke rapirsîyek cemawerî deverên han vegerin himbêza kurdistanê , lê ya xuyaye ku hekûmatên îraqî ( alawî ,caferî , malikî ) ne amedene bo çareserkirina vê kêşê û herweha kosp û rêgirin di pêşiya daxwazên miletê kurd , û rûdana 22 tîrmehê di perlemanê îraqê de bû ne di berjewendîya gelê kurd de ye û têperandina made 24 bi rengekî ne yasayî dibê pêşêlkirinek bo destûra îraqê û herweha made 140 di helwişîni , ev çende bû cihê nîgeranîyê li nav şeqama kurdî û bo vê mebestê çendîn xwepêşendan hatin sazkirin li bajarên kurdistana îraqê (kerkûk , silêmanî , hewlêr , dihok …….) û herweha perlemanê kurdistanê çendîn daniştin girêdan sebaret van pêşhatan yên li kerkûk û xaniqînê û gelek deng hatin bilindkirin û ji serkirdayetîya hikûmeta herêmê xwestin ku dûbara çav li siyasatên kurdî bêna neqandin ku ya xuyaye hikûmetên îraqî çi dîmuqratî bin yan diktatorî bin çi cêwazî nînin di navbera wan de sebaret mafê gelê kurd.

Ya diyara ku serkirdayetiyên îraqî bi çandek çewt û şaş hatine perwerdekirin ew jî çanda basiyan û nijadperesiyê ye û bi hîç şêweyî mafê miletê kurd na pejrênin û dibê miletê kurd qazincê ji waneyên xwe bigrê û dûbara tûşî fêl û xapan nebê û herweha dibê kerkûk bibê despêkek bo qûnaxeke nû ....

## SINÛRÊN SOR

***Ebdilrehman APO***

Sinûrên sor bi basikên reş,… konên xwe yên qulqulî,… li nêzî hêla devera jiyanê vegirtin,…û di şeva nîvê şevê de, çar kes mîna hovên girs, bi cilên reş, bi pepilin mezin bi pirçên reş û sipî werdayî, û bi neynokên tûj û dirêj, ji deriyê konan derketin, û li sînga pesarê gewir paldan, û hin alavên curbecur danîn ber xwe,… piştî demek kin, du kes li wan bûn mivan, wek xwiyabû … biyanîbûn, bi nîşan, û hejmaran têkîlîdikirin, loma jî ti dengkirin û axaftin di navbera wan de tinebû, … şefaqa sor û zer xwe li bejna çiyayên bilind werdand, tîrêjên royê bi kûrbûn xwe di nav pelên daran re bi tewşankî berdidan, û sersiyên daran ji ber dipekîn, û direviyan,… her

Dûmahî .. R 7

## Sinûrên sor .. Dûmahî

çar kes ji pesarê gewir kişiyan, û bi zikxwişî, mîna marên "EJDÎHA", berve dehil, û daristanan,.. xwîşiyan, û badkarî li waran çandin, û tamarê jiyanê, bi cawbirek tûj birîn,.. û devê tamarê li erqek kevnar sîwarkirin, û kaniyek ji rengê sor… derbû, û delavek ji xwînê herikî,.. dilê perîşan di erqêde pirpitî,.. jê derket qêrînek û kevokek sipî, li ezmanê hişîn bûn mivan,…li vegerê bi xwe re laşek anîn û li meydanê konan danîn, li ber rojavayê,.. maseyek mezin çarkoşeyî venan, û laşê dîl..! li ser dirêjkirin, û di nav berê xwe de, bi kêrek tûj laşe kirin çar par…! û bi hovîtî bi ser ketin, û diranên qirêj tê de gerandin, û laşe tîştîşî kirin,… çavdêr ji xwe pirsî bi matmayî.:

Çi çêbû gelo, ev çi hovîti ye .? çawa laşê merovan tê xwerin..! ma gelo ev virr û derew bû ,… yan rastîbû ? çavdêr ji ser zinar û lata xwe daket , û serê xwe bada û hejand , berê xwe da welatekî biyanî dervî sînor ta ku ji hovan xelas û rihabibe ,… sînor derbaskir , hêzin ewlekariyê yên wî welatî çavdêr kirin ber pirs û mirsan , xwiyabû nikaribû ti bersîv bidana ,… çimkî bedena wî ji hev şelyabû, ziman zûyabibû, bihistina wî giranbibû, lêvên wî qelişyabûn,.. belkî ji tirsa re, nizanim !…. pirsiyar demek ji vehesê dayê.. rojek di ser re derbasbû, pirsiyar jê pirsî: - çawa tu gihêjtî vira, û ji çira, û tu çi kesî ? bi zimanek zelal got : - ez kurd im, ez merov im, ji welatekî xweş û rind im ji bihiştê ji welatê royê me,… jê re dibêjin "Kurdiastan", ji dest hovan ez diver re derketim… hovan weltê min dagîrkirine, laşê merovên kurd herdem çar par dikin û dixwin…! Ji ber vê yekê ez bi hêvî me, û li benda merovantiya we me ku hûn bi kurdan re alîkarbin, çimkî gunê ye ku weltê royê di nav lepên hovanda bimîne,…ez bawer im rojekê bê welatê min, welatê kawayê hesikar û mem û zînê wê serfiraz û azad be. Di demek nêzîk de di dema vebûna gulên sor di buharek qert de, li ser taximên sinûrên sor.

## BERÊ BÛYERAN .. Dûmahî

tê de bandewariya çareyên guncaw bike ji kêşe û pirsgirêkên xwe re. Û xuya ye ku rijêmên Kurdistan di dest wan de ye qezencê ji vê rewşê dibînin.

Hema sebaret bi rewşa li Sûryayê , em dikarin bibêjin ku rijêm hewildide ji bo her guhertina di helwesta navdewletî de bixe xizmeta xwe û zordariya xwe bihtir bike di hundir de. Tiştê vê dawiyê bûyî di rewşa navdewletî û herêmî de jî xuya ye ku hindekî ji hêviyê bi rijêma sûrî re çêkiriye . Û ji ber vê em dibînine çawa ev rijêma ji layrkî de dixwaze rûyekî baş bide xwe li derve û têkeliyên xwe yên diplomasî bi Libnanê re avadike û biryara vekirina balyozxaneyê li Beyrûdê û pêşwezîkirina wezîrê derve yê Libnanê ji bo vî îşî û supasiyan werdigira ji hindek rijêm û dewlet de.. Û ji layê din de jî zor û stema xwe ziyadtir dike sibaret bi hundir ji girtina siyastemedaran û xwediyên nerînê ji serokatiya «Îlan Dîmeşq» û yên berî wan û yên piştî wan heya girtin û berdana birêz Mhemmedê Mûsa (sekreterê partiya çepê kurd li Sûriyayê), û girtina birêz Meşelê Temo (berdevkê fermî bi navê Şepêla pêşeroja kurd li Sûriyayê).

Tiştê herî xerab jî di vî biwarî de guhertina yasaya 41 ya sala 2004ê bi yasaya 49 di 20\9\2008ê de.. ya ku herêmên Kurdistana Sûriyê hemî wek barek awarte dibîne. Ev jî – di nerîna me - de temamkirin e ji projeya «Qayîşa erebî» re ya ku hate pêşinyarkirin di destpêka salên şêstêyan de li ser destê Mihemmed Teleb Hilal û jê re rê xweşbû ji wê demê de heya ku bikarhat bi biryara seroketiya qutrî ya partiya El-Be'is di meha Cehzerana sala 1974ê de û li encamê xakên kurdan ji wan hatine standin û dane dest ereban.. ev yasaya nû jî xelekek qirêjtir e di vê zincîreyê de.

Rewşa kurdî li Sûriyayê êdî gihêjtiyê radeya herî aloz, û hebûna kurdan li ser xaka xwe ya dîrokî ketiye metirsiyek mezin û nema êdî bêdengî bi kêr tê. Loma em bangekê bi rêdikin ji hemî kurdan re, û berî hemiya ji partiyên kurd re, û bi taybeti serokên wan, ku bilivin bi rexê xebateke rijd de, û bibin yek dest û yek rêz li dijî vê pilana regezperest ya kevne – nû .. çimkî eger ku ev pilan bi serkeve dê dawiyê li dawîn hêviyan bihîne.

***Abdullah ÎMAM***

# PAYÎZXÊREK *

***Evdî Qadir***

*Bêriya te kirye min*
*Xoşewîstim ..*
*Ey sinbila sor , sinbila pîroz*
*Ey ..*
*Çîlkên barana jana min*
*Ya ku xwe*
*Di hinarokên rûyê bê re*
*Vedidze*
*Bo zamên belkona min*
*Ey ..*
*Lêvên elendeyeke dûr*
*Yên ku*
*Li pêsîrên*
*Sirûda roçûnavaya ku em li bendê*
*Digerin .. da ku ew*
*Jê bimêjin*
*Ey .. ey mirariya çemê evîna serjêkirî*
*Ya ku li ser*
*Lêvên awazên kemançeyê*
*Dilerize ..*
*Ey ..*
*Çîlkên şevnemeke*
*Di singên girtîxaneyên*
*Gulên bêguneh de*
*Ey çavbikila hingivîn*
*Ey dagêrkera dilê min*
*Ji dema qîrîna bangewaziya min de*
*Taaaaaaa…*
*Ta rojên ku di mindaldana*
*Dahatûya rojên paş*
*Mirinê de ne .. mirina min*
*Ma ..*
*Li pê awirên te yên hejar*
*Çiya dê*
*Li ber xwe bidine ?!!*
*Waaaaax .. hey qozika hîvê*
*Li ser lêvên te*
*Di heman çaxê de*
*Ez hatme rizgarkirin*
*Û*
*Ez hatme dagîrkirin*
*Qe ne bi çaya min bû*
*Ku dê kenê te*
*Bibe qada şerê ku ezê*
*Termê girnijîna xwe*
*Bihêlim lê*
*De ..*
*De ey yara ku*
*Bi sibeha hêsrên min yên tavîr re*
*Rabûye dansiyê*
*Weku min ti rojan nekirye*
*Bi te re ezê*
*Rabim dansiyê .. dansiya Zorba*
*Lê tenê demeke*
*Bi qasî*
*Temenê çixareyeke bê xwedî*
*Ku di nav tiliyên xwelîdanekê de*
*Ji bedena xwe dixwe*
*Ev ji ber ku*
*Tenê*
*Dansiya zû dimre*
*Tenê ew*
*Temenekî dirêj*
*Dijî*
*Li ser lêvên azadiyê.*

---

***Şanek:** Ev hestên ku di navbera xêzan re diherikin , berê mara xwe bi zimanekî bêgan re birîn , zimanê ew kesên ku min û zimanê min nayinin ser zêman , lê engustên " narvîneke " raxistî ev nemamên ku ji dest zînata zimanekî bêgan, penaberî*

*Axa wî zimanî bi xwe bûne.. derxistin, û di axa ferhenga Xanî de - ji nû - perwerde kirin.*

*Xoşewîst : yar*
*Zam : birîn*
*Elende : şefaq*
*Mindaldana : malzarok*
*Dahatû : paşeroj , diwaroj*
*Ça : bêjeyeke Kobaniye wateya **gumanê** dide*
*Zorba : lehengê romaneke yewnaniye*

## WELATÊ ME YÊ ÇELENG

***Riyad Salih Elhuseyn***
***Wergerandin Bo Kurdî** :*
***Fadil Temo***

Ber bi ber
Tu rojên min jêdikiye
Ey welatê min yê çeleng
De guhdar be :
Tu yek nastiriye
Ji pêv pêlte

# WELAT LI BA CEGERXWÎN

*Cankurd*

**K**aniya hozanvaniyê evîn e. Evîn û hezkirina mirovan jîn û jiyên wan xweş dike an pîs dike. Gava em li dîroka hozanvaniya cîhanî binêrin, emê gellek hozanvanan bibînin, ku hezkirin û evînê ewan namdar kirine. Lê mezintirîn evîn û hezkirina **Cegerxwîn** bo welêt bû. Welatê wî di jîna wî de û jîna gellek hunermend û nivîsevanêt kurd de têlên tenbûrê, malika hozanê, ronahiya rojê, mûma şevê û yara dil bû.

**Cegerxwîn** ji welatê xwe re pir nalîn û axîn rêz kirin û di teviya jîna xwe de bo welêt dengê xwe bilind kir û bi evîna Kurdistanê namdar bû.

**Cegerxwîn** di demeka dîrokî ya giring de jîna xwe borand **(1903-1984 z.)**, demeke giring e ji ber ku tevgera gelê Kurdistanê di van 80 salên borî de, di gellek koçberên xwe yên rengareng re derbas bû, û ji aliyekî din ve giringiya vê demê ji guhartinên civakî yên jîna gelê me tê.. Bi ser ve jî pêşketina mirovatiyê û serketina gelên cîhanê dijî hêzên koledar û kolonyalîzmê, di va dema dîrokî de, bi xortanî û bi firehî bû.

Di va gotara kin û kurt de, armanca min ewe, ku ez nêrîna **Cegerwîn** di warê **Ş**oriş û serxwebûnê de bidim ber lêkolînê û derxînim ber ronahiyê, ev jî karekî ne asan e, ji ber ku jîn û xebata **Cegerxwîn**, weke **Prof. Qanatê Kurdo** di sergotina dîwana **Cegerxwîn** a 5""""ê de gotiye:

"**Cegerxwîn bi rewşa xwe ve, bi efrandinê xwe ve, bi ramana xwe ve, behra bê berî û bê binî ye, gelek girane meriv noqî wê behrê be û bizanibe çi di wê behrê da heye.**"

Armanca min ji vê gotarê ew e, ku ez ji xwendevanan re diyar bikim, li ba **Cegerxwîn** bîr û baweriya şoreşa serxwebûnê ji destpêka xebata wî ya hozanî ve xurt bû, wî ji serxwebûnê re hozan vehûnandin û şanî gelê kurd kir, ku şoreş bo serxwebûna Kurdistanê rêya wî ye û divê xwe jê re amade bike û her tiştekî jê re erzan bike, can û mal û teviya heyîna xwe. Lew re ewên ku li **Cegerxwîn** xudan derdikevin û li hember şerê serxwebûnê radiwestin, du caran xwe dixapînin:

**Yek- Cegerxwîn ne hevalê bîr û baweriyên wan ên şaş û teng bû . Du- Ewan nikarin çi caran xwe bikin hevalên Cegerxwîn, ji ber ku daxwazên wan û kirinên wan nabin yek.**

**Prof. Qanatê Kurdo** di sergotina xwe de dibêje:

" **Di jiyîna Cegerxwîn da li nav her çar parên kurdistanê da gelek rojên giran qewimîne, li jiyîna xelqê kurd da gelek caran bûye reşebayî, babelîsk, tofan û baran, lê teht û kelemên serê çiyayên Kurdistana dabeşkirî li ciyê xwe da mane, ne leqiyane; Cegerxwîn jî mîna wan teht û keleman li ser bîr û bawera xwe da bi qayim, berk rawestaye, ji ciyê xwe çep û rast neleqiyaye, ne hejiyaye..**"

Heya mirina **Cegerxwîn** 14 afirandinên wî hatibûn çapkirin, ji dîwanan (7), Romana **Reşoyê Darê**, **Cîm û Gulperî**, **Mîdiya û Salar**, **Gotinên pêşiya**, **Destûra zimanê kurdî** û du birên **Ferhengê**. Loma tênêrîna berhema **Cegerxwîn** histobariyeke mezin e, divê mirov xwe jê re amade bike û demeka dirêj têde bixebite.

Di vê gotarê de, em di nav bax û gulistana **Cegerxwîn** re digerin û bihna kulîlkên evîna wî dikin.

Welatê me li ba **Cegerxwîn** çi welate ?

" **Welatê kurda tev xêr û bêr e**
**Hemî maden e, tev zîv û zêr e**
**Lê çi bikim îro maye ji xelkê re**

**Welatê kurdan hemî cymene**
**Egîd û şêr û piling tê hene**
**Hemî heval û pismamê me ne...** "

*- Helbestên bijarte, rûpel 94 –*

Di gelek ciyan de, li ba **Cegerxwîn**, ev dêmenê welat ê xweş û baş tê ber çavan:

" **Zengîn e welatê me,**
**hemî kanî û zêr in**
**Em tev wekî şêr in**

**Dûmahî .. R : 10**

**Welat lib a Cegerxwîn .. Dûmahî**

**Rengîn e hemî deşt û çiya**
**Av û giya ne, tev bax û bihişt in** "
- *Helbestên bijarte, r. 9 –*

Ev xweşî û rindiya welêt, ji zû de, li ber çavên **Cegerxwîn** e, di dîwana yekemîn de, jî van rewşên delal li ser welatê xwe gotine:

"**Kurdistan pir xweş û geş,**
**ez jê re tim dinalim**
**Ew asîtanê kurde, şîrîn e deşt û zinar**

**Zinar û bax û bostan, zeytûn û sêv û hirmê**
**Hincas û xox û mişmiş,**
**bihok û giwîz û hinar**.."
- *Dîwana yekan, r. 10 -*

Hebûna xêr û bêrên welêt, her di dilê **Cegerxwîn** de cî girtine û bala wî kişandine ser xwe:

"**Kurdistan tev kûp û bel û**
**deşt û kel û şax in**
**Dexl û av û dar û ber û**
**gund û rez û bax in.**."
- *Dîwana yekan, r. 24 -*

Kurdistan li ba **Cegerxwîn**, xwe bi xwe wilo nîşan dide:

"**Gula baxê bihişta rojhilat im**
**Di tarîka şevê rojim, hilat im**
**Ji nav sînga demê pijqîm îro**
**Di tarîxê fireh hat im, Ferat im**.."
- *Kîme ez, r. 109 -*

Kurdistan bi xemla xwe ya rengîn, bi co û cobarên xwe, bi çem û rîbarên xwe ve, nola keçeka bejin bilind xweyadibe:

"**Bilind e bejn û bala te**
**Li ser taca te ezman e**

**Kitanek reng sipî daye**
**Serê zozan û Sîpan e**

**Li jorê kanî û cobra**
**Wekû hêstir dibarin xweş**

**Li jêrê te dibênim ez**
**Bihişt û bax û bistan e**

**Kirasek etlesîn kesk e**
**Bi rengê roje nexşîn e**
**Li bejna te dibênim xweş**
**Bi surme şal û mîtan e**.."
- *Ronak, r. 54 -*

Bax û bistanêd Kurdistanê hesret û xema xistine dilê hozanvanî, ku di xwe de dinale, îro bi dest dijmin de mane:

"**Bax û bistan im ka ?**
**Ax gulistan im ka ?**
**Dijmin tev girtin ax !**
**Ax Kurdistan im ka ?..**"
- *Dîwana yekan, r. 39 –*

Ew ne tenê şîrîn û rindik e, ew bo me dayîk e:

"**Em anîn cîhan wê Em kirin însan wê**
**Lê me zû ew berda**
**Ax Kurdistan im ka ?..**"
- *Dîwana yekan, r. 39 –*

Li ciyekî de **Cegerxwîn** li ser welatê xwe nazik-nazik dibêje:

"**Kurdistanê, Kurdistan !**
**Bexçê gula, derdê dila** !.."
- *Kîme ez, r. 38 –*

Welat li ba **Cegerxwîn**, ne tenê şînayî, av û kaniyên sarin, an jî dexl û bistanin. Welatê me tev zêre û dijmin ji dest me revandiye :

"**Çol û deşt û lat û şaxên**
**te hemî miştin ji zêr**
**Dijminan ew tev revandin,**
**mane em bê xêr û bêr**"
- *Dîwana yekan, r. 69 -*

"**Welat xweş e, tev xêr û bêr**
**Petrol û hasin, zîv û zêr**
**Bindestê dijmin, jor û jêr**
**Ta kengê kola bin, bese** !"
- *Kîme ez, r.19 -*

Raste ev welata kaniya zêr û petrolê ye, lê xwediyên va welatî her birçîne, dijmin têde têrin:

"**Welatê min bihişte, kaniya zêr**
**Belê şêr têde birçîne, gurin têr**"
- *Kîme ez, r. 45 -*

Welat li ba **Cegerxwîn**, di gelek rist û hozanan de keçeka çeleng û lewend e, ên mîna **Cegerxwîn** jî bûne evîndar û dilxwazên wê, hezkirina hozanvanên kurd ji welêt re, ewan tev gihandine rewşeka evîndariya bê nîşe. Ev rewş li ba **Cegerxwîn** zor diyare:

"**Welat yareke pir xweş û dîdar**
**Li ser dinalin hezar evîndar**
**Li rast û çep kutî, birîndar**
**Malwêrane ê dosta wî bedew**"
- *Kîme ez, r. 31 -*

**Dûmahî .. R : 11**

**Welat lib a Cegerxwîn .. Dûmahî**

**"Keçek min dî ciwan û xame ber bext,**
**Li wê çûne gelek çax û dem û wext**
**Me jê pirsî ji ku ye, ey keça rind ?**
**Kenî û go ji Loran ta biçî Bexd**
**Me go ey keç tu Kurdistanî ? ez kurd**
**Kenî û go: ne kurdî, ka ber û rext**
**Serê xwe min tewande ber nigê wê**
**Binêr gorî dilê min bû hemî sext**"
*- Dîwana yekan, r. 60 -*

Ev rewş û dêmenê welêt, li ba **Cegerxwîn** di teviya karê wî yê hozanvanî de diyardibe, welat keçeka ciwan e, xweşik e, desgirtiya wî ye, li hêviya mêr û şêrên cengê ye, ew revandine, birîndar e, xembar e û qêrîn û hawara xort û lawanên kurd dike, ku wê ji bin zordariyê derxînin:

"**Xemlandî me seranser,**
**dezgirtiya xorta me**
**Gerden sêvek sor û zer,**
**li hêviya merda me**
**Qelen xwîn e ne gewher,**
**Kurdistana kurda me**
**Bê tang û top û leşker,**
**îro we ez berda me**
**Kurdisatna delal im,**
**herkes tê min dixwazî**
**Ez pir şox û şepal im,**
**min deng daye bi nazî**
**Ev bûn bîst û du sal im,**
**li ser min ceng û bazî**
**Kurdo wer min bixwaze,**
**belê bi serfirazî**"
*- Helbestên bijarte, r. 58 -*

Welat bi xweşî û rindiya xwe, zordariyê li dilê hozanvanê me dike:

"**Çi reng şîrîn e yara min**
**Şepal û nazik û şox e**
**Ferat û Dicle û Xabûr**
**Bi ser bejnê de berdan e**

**Ji xwîna min tu lêv sorî**
**Ji bîna min gula corî**
**Tenê min bazinê zendên**
**Te zencîrin di linga ne**
**Evîna te kirim seyda**
**Birîndar û perîşan im**"
*- Ronak, r. 54 -*

Ev sîtemkariya welat di hinde ristên din de jî, tê ber çavan:

"**Pêtiya arê evîna te ye dil kirye pereng**
**Me çiqas xwest,**
**ku veşêrim lê bi zor dayîye deng**

**Wek te mêrkuj me nedî**
**kes we bi xwînrêjî bijî**
**Ku evîndarê xwe carek**
**dikujî wer bê xedeng**

**Me go qey dost û hevalî,**
**bi te re bûne heval**
**Ji me dil bir te bi tayê**
**serê zulfa xwe ye şeng**

**Me nedî çend geryam,**
**ez ne di Şam û ne di Îraq**
**Kes di rengê te şepalê**
**nazik û şox û çeleng**
**Te ji Salarê çeleng girtiye ev zor û sitem**
**Herdu ebrû te şikandin**
**li me bûn şêr û pileng**"
*- Helbestên bijarte, r. 88 -*

"**Lê ne tenê ew aşiqê welat e,**
**belê gele hozanvanên**
**din jî di wê rê de çûne:**

"**Ji bona her kesek yarek heye,**
**ê min welat yar e**
**Belê çibkim di destê**
**dijminê xwînxwar û xeddar e**

**Çiqas pesnê giran bêjim,**
**nikarim ez bidim zanîn**
**Çeleng û nazik û şeng û**
**şepal û şox û cebbar e**

**Hezar wek min di vê rê de,**
**bi van derd û kulan kuşt in**
**Tilisma ser devê genca,**
**di sînga min de: reşmare**"
*- Helbestên bijarte, r. 73 -*

Qelenê welatê **Cegerxwîn** ne zêr û zîvin, ne cewher û elmasin, tenê xwîna lawan û merdane:

"**Qelen xwîna min e çibkim ?**
**Divê ku ez bidim carek**
**Meger can û ciger deynim**
**Di vê rê de, çi erzan e** !"
*- Ronak, r. 55 -*

"**Welat xweş bûke**

**Dûmahî .. R : 12**

**Welat lib a Cegerxwîn .. Dûmahî**

**Xwîna me qelene**”
*- Ronak, r. 69 -*
Lê Kurdistan ne tenê şêrînî, ciwanî û evînî ye. Li Kurdistanê kuştin û talaniye, darvekirin û sotin e, wêrankirin û girî ye:

**“Ey dil li qiraxê çemê Amed rûne sergerdan**
**Rind çavên xwe veke,**
**temaşake welatê kurdan**

**Li bajarê Amed çikandine çend sêpî**
**Bi wan ve daleqandine cindiyê zazan**

**Li alîkî tac û telesan bê xwedî ne**
**Li alîkî kolosên kevej ketne bin lingan**

**Ji berîka xwe desmalekê derxe û çavên xwe**
**Paqij ke,**
**ji wan hêstirên xwe wek tav û baran**”
*- Dîwana yekan, r. 33 –*

“**Sêpî li Kurdistanê çiqandine herdem**
**Bi wan ve daliqandine torinên kurdan**”
*- Dîwana yekan, r. 45 –*

Wan bax û bistanên welatê me yê, ku **Cegerxwîn** ji evîna wan dinale, hatine sotin û pelixandin:

“**Agir bi Kurdistanê ket,**
**lewra dikit haware dil**
**Sed bax û sed bistanî ket**
**manendî bilbil jare dil**”
*- Dîwana yekan, r. 20 –*

Di welatê Cegerxwîn de, kuştin û talane, perîşanî û bindestiye:

“**Alîkî welatê te maye perîşan û bindest**
**Li aliyê dinê, talan û kuştin û tim qîrîn**
**Pîr û kal û keç û xort û şîrmij û zarok kuştin**
**Porgijgijî sergeverin, tu li wan dinêrî wek dîn**
**Zarokên xwe,**
**ji ber sînga xwe davêjin, ji tirsa**
**Bazdidin û li wan vedigerin, dil bi kul digrîn**
**Li jor balafir û li jêr otmatîk û mîtralyoz**
**dikin qêrîn û dibêjin, haydê lêxin kurd revîn**”
*- Dîwan a yekan, r. 96 –*

Ji berê zû de, ev welata di rew_eka wilo de mayî, rût û zuha bûye, dijmin par kiriye, dubendî xistiye nav gelê wî de û xwîna wan mêtiye:

“**Welat hezar sal in beyar**
**Di nav de wer bê tînim ez**
**Hemî pûş û pelax e lê**
**Pir baş e ku hê şînim ez**
**Dijmin du sê xet lê kişand**
**Jehra dubendî lê reşand**
**Xwîna dilê min mijand**
**Ev çende pê şêrînim ez**”
*- Kîme ez, r. 54 -*

Ev zordariya dijmin, bi hawar û qêrînê naye rakirin, tenê xwînrêtin ji me re welat vedigerîne:

“**Welat ket e dest neyar**
**Nayê dest me bi hawar**
**Divê xwîn bê rijandin**
**Milet pê bê pijandin**”
*- Ronak, r. 117 –*

Gelê kurd her di ber welatê xwe de xwîn daye û çi caran ji vê rê venagere:

“**Xakî Kurdistan ! bi qurban,**
**pir ciwan û paqijî**
**Xwîn rijandin pir kurên te,**
**wa li her alî rijî**
**Milletê kurd ta ku sax e,**
**ew ji vê rê nagerî**
**Aferî, aferî ! Qadî Mihemed, aferî**”
*- Helbestên bijarte, r. 67 -*

Lê çiqas welat di bin destên dijmin de bimîne, dîsa jî nabe ê wî, ew welatê me ye:

“**Welat li ser navê me ye**
**Navê kal û bavê me ye**”
*- Ronak, r. 72 –*

Ew welatê, ku ciwan û xweşik û çeleng bû, niha bûye pîreka porsipî, pûş û pelax e, belengaz e:

“**Bibêje ez keçek bûm, ta ku bûm pîr**
**Nedî min xwe wekî vê salê êsîr**

**Serê min bû sipî, pûş û pelax e**
**Li jêrê min çu nîne xeyrî ax e**

**Ji çavên min diçin sed av û sed co**
**Ji min êdî dikin gazinde zaro**

**Xerab bûne ji min sed xan û qonax**
**Nemaye bo perîşanan du sê max**”
*- Helbestên bijarte, r. 6 –*

Bo çi welat ketiye va rewşa tehl û tirs, **Cegerxwîn** dibîne, ku ne tenê dijmin har û hov e, zordar û talanker e, lê bi wî re di herdeman de aliyek ji me hevalbend û dost neyar bûne, em û welat sipartine

**Dûmahî .. R : 13**

**Welat lib a Cegerxwîn .. Dûmahî**

dijmin:
“**Mirov tev du qatin û qatek li jor**
**Hemî tişt ji wan re diriste bi zor**

**Ji dijmin re bindest û kola û seg**
**Li ser me dibin şêx û paşa û beg**

**Welat perçe, perçe kirin wek reza**
**Em û xwe bi hevre sipartin diza**”
- *Zend-Avista, r. 159 –*

Dezga û karxanên çêkirinê di welatê me de nînin, loma em û welatê xwe wilo perçe, perçe man e, li şûn mane û emê hertim di bin destên neyaran de bimînin, eger em xebata çêkirinê pêşve nedin:

“**Welatê ku dezga bi pêş de nebî**
**Ewê tim di destê neyaran de bî**”
*- Zend-avista, r. 98 –*

Divê em kar û xebatê bikin, xwe fêrbikin çêkirinê û ji hesin û avahiya acetan hezbikin:

**“Ji bo ku welatê xwe pê bidne pêş**
**Nemînin di nav de, ne zor û ne êş**

**Ji hasin re milxwar û piştxûz bibin**
**Bi çakûç û mêkut, bi serkûz bibin”**
*- Zend-Avista, r. 100 -*

**Cegerxwîn** ji welat dipirse:

**“Hey welat bo çi perçe perçe maye**
**bin destê neyar**
**Hakimê xakê te bin,**
**ê wek Seîd û wek Beyar**
**Kurdê bextreş serşikestî,**
**wer bimênî çarkenar**
**Kuştin û zindan û lêdan,**
**bêne wan tim boks û dar**
**Hey welat heqê me ye,**
**hê em ji xew nabin şiyar”**
*- Helbestên bijarte, r. 40 -*

**“Welat ta kengî wilo perçe bî ?**
**Em tev di nav de, jar û şikestî”**
*- Ronak, r. 69 –*

Baweriya Cegerxwîn bi serbestî û azadiya welêt mezin e, û ew dizane, ku wê ji bin destên dijmin derkeve:

**“Welat xeyrî te min navê,**
**meger dinya ku kewser bî**
**Bi xurtî dê tu serbest bî,**
**ji min êdî tu bawer bî”**
*- Helbestên bijarte, r. 72 –*

Li ciyekî dî jî dibêje, ku:

**“Welatê me Kurdistan, wer namînî kolestan”**

û ji ber ku bilindî, pakî û rindiya mirovî bi welêt ve girêdayî ye :

**“Welat çiqas bilind bibî**
**Ew qas e jî bilind dibim**
**Her çend pak û rind bibî**
**Ew çende pak û rind dibim”**
*- Kîme ez, r. 17 –*

Ji ber vê yekê Cegerxwîn bang li xort û lawên Kurdistanê dike, ku bila ewan şerm û fedî bikin û xwedî li welatê xwe derkevin:

**“Welatê te zîndan e, pir teng û kûr**
**Di nav de dinalin, hemî kûre-kûr”**
*- Zend-avista, r. 134 –*

**“Ziman û welat û millet perçe bûn**
**Ji dijmin re hiştin me mal û hebûn”**
*- Zend-Avista, r. 111 –*

**“Ne şerm e welatê te wer perçe bî ?**
**Kirasê hejarî li bejna te bî ?”**
*- Zend-Avista, r. 111 –*

**“Were em bi hevre bibin wek bira**
**Welatê xwe derxin ji destê gura”**
*- Zend-Avista, r. 113 –*

Divê xurt û lawên kurd bixwênin û hişyar bibin, ku kanibin, rohniyê têxin welatê xwe:

**“Çi tiştên ku başin, bixwîne timî**
**Welatê me ronî dikin ew hemî”**
*- Zend-Avista, r. 159 –*

Cegerxwîn dibîne, ku eger doz û daxwaza welatê me wekhevî , hevparî û hevjîn be, wê evîna me yê dîsa şîn bibe, û wê çira di tariya jîna me de vêkeve:

**“Ku rista welatê me bû wekhevî**
**Hemî kes xwedî mal û zêr û zevî”**
*- Zend-Avista, r. 106 –*

Lê ew, mîna mirovekî xwedî baweriyek çînî bû, dibîne ku parçebûna Kurdan ji dest çînên jorîn e:

**“Ku qata bilind çû, dibin tev bira**
**Evîna welatê me xweş bit çira”**
*- Zend-Avista, r. 107 –*

Bêguman rêya serxwebûn û azadiya welêt, li ba Cegerxwîn jî ne tenê xwendin û rakirina qata jorîn e, ew jî weke hozanvanekî azadiyê banga şorişê dike, dizane ku rizgariya welatê wî tenê bi şorişê tê. Lew re emê careke din li hozanên Cegerxwîn vegerin û li ser ramana şoriş li ba rawestin.

**.....................................................................**

**Zarathustra News –**
**zarathustra_news@comhem.se**

# Zarotiya NEYNIKEKÊ û tistin din

ROMAN - Pîr RUSTEM

## Xeleka pêncemîn û dawîn

Hîne ew û jinika xwe di derî de rawestiya bûn û nedizanîn ewê çi bikin, Kalemêr radihêje balîvê ku, ji hev êxistibû û dixe hembêza xwe û mîna ku, yek rahêje zaroyekî xwe, dêst di ser re dixuşîne û dema riwê xwe datîne ser, bi dengekî bilind digrî.

- Bes dînek ji evê malê kêm bû. Gava Agob dibîne ku, ew çû û di quncekî odê de rûnişt û balîvê perçiqandî li ser kapoka xwe danî, li jina xwe vedigere û dibêje: De ka em herin, xûya ye dixweze zaroya xwe di xewê ke. Rastiyek di gotina wî de hebû; piştî ku Şêrîn bi ewê şêweya vê sibê derketibû, divyabû wê vegerîne û gula di dest xwe de bide wê.. . Û gava ku, gulê berve wê dirêj dike û ew ji dest wî nagre, radihêje bastûn da ku wê bitirsîne, lê dema dibîne ku, ew bê şerm û tirs xwe di ber ewê din re dirêj dike, nema Kalemêr xwe digre û bi lêdana pêşî re dihêle Koçer bi derve de bireve. Wî yê bi evê yekê bikra eger ku, wê jî nexwesta bida dû wî, evê yekê hêşt ku ew hêrs bibe û nema dizanî çi dike.

- Çima te ez hêştim û tu çû.. , na hûn derewan dikin. Tu guh nedî wan, ha.. ha.. birevin, bide dû wan, çima tu xwe vedişêrî. Min nebirî, bi Xwedê ne ezim, na.. na, min girênedin.. min li vir nehêlin.. . Yadê neçe, min berdin. Te jî pir tişt ji min dizîbûn. Dema ku dengê Kalemêr bilind dibe, cîran ji nuh ve li ber deriyê wî kom dibin. Ev ne cara yekê ye ku, ew dikeve vê rewşê, lê ev car bilindtirî her care.

- Ka derkeve cem wî û hinekî pê re bi axiv, belkî ew hêdî bibe. Jina Agob jê dixweze.

- Te nedît cara paşin çikir; tu dixwezî ku ew bastûnekî li qoqê min bidî. Lê gava ku dibîne kirêciyên avahiyê li ber deriyê Kalemêr kombûne, ew jî derdikeve û bi derketina xwe re dêng li wan dike: Wî bi tenê bihêlin, kombûna we dihêle ku, ew mîna gayekî berdayî har bibe. Agob bi nermî dikeve cem wî, ev deh salên wanin ku, ew bi hev re ne, kêmkasiyên hevdu nas dikin. Ew hinekî hêdî bûbû, balîvê ku ji hev xistibû daniye aliyekî û cixara tutûn di nav lêvan de dilerize. Bê axaftin ew hinekî dûrî wî rûdine, Kalemêr qutiya tutûn ber bi wî têve dide, bi vekirina devê wê re pişkeke bi hêz ji bêvlên Agob dikşe. Ev bêvlên segane, bawerim ku çewtiyek çêbûye; bes ku bihneke biyan dikim, eve rewşa min. Carekê zimên di ser lêva pelê cixarê re dibe û bi çend diranên nîv kefnikî, ewî pelî di çend ciyan de dikurisîne û bi hosteyî, tiliya xwe di ser lêva wê ya şil re dixuşîne.

- Tu hatiye da ku çêrokê bibhîse. Bêyî ku serî hilde, Kalemêr dibêje Agob.

- Dev ji çêrokan berde, eger ez neyêm ba te ezê bi kuve herim; hema rûniştina bi te re çêtirî mayîna bi Marye re ye. Wî dixwest li ser jina xwe bi peyve, lê tirsiya ku dengê wî bêtirî çend mitrên odê bimeşe. Te nan nexwar , ka rabe em herin û bila xwarinê ji te re çêbikin.

- Dilê min nakşîne, bes bila çayekê bidin me. Bêyî ku Agob ji cihê xwe bilive, dêng li keça xwe dike û çayekê dixweze. Ew hîne rûniştibûn, Koçer derbas, oda xwe dibe, bi hatina wî re madê Kalemêr zer dibe û hin gotin li ser zimanê wî şîn dibin.

- Çi di nav bera te û wî de çêbûye. Agob ber bi deriyê Koçer dinire û pirsa xwe mîna marekî reş davêje, dihêle Kalemêr komî ser hev bibe.

- Ne tişt. Bi tiliyên rizyayî dêst davêje qutiya tutûn.

- Tu ji berî aniha rastî wî hatiye. Agob xwest di deriyekî nuh re êrîş wî ke.

- Tu çima dixwezî dijmantiyekê têxe navbera me.

- Ez..!

- Belê, ev bû çend carin tu evê pirsê dikî û min gote te ku, ez wî nas nakim, ti tişt di navbera me de tine ye, vêca tu çima pirsa xwe dubare dikî. Agob têghêşt eger ku hinekî din pêde biçe, dê têkeve rewşeke tehil, lewre bi nermî jê dipirse: Tu ji zûde bi ser zarên xwe de çûye. Kalemêr têneghêşt ka ew çi dixwez e, lê gotina; “zarên te” dihêle ew bikene û berve oda Koçer binire.

- Zarên min, kê gote te zarên min hene.

- Dîsa jî ji bilî xwe çêtirin, te yên xelkê nedîtine.

- Li ser çi, ev bû deh salên min in ku ez li ba we me, te ew carekê jî li vir dîtine. Eger

**Dûmahî .. R : 11**

**Zarotiya neynikekê .. Dûmahî**

ku kerekî yekî hebe û pîr bibe dîsa jî ew wî navêje û her çendekî bi ser wî dikeve, ka çi bi wî hatiye.
- Tu çima rindiyên wan winda dikî; her meh ew mizaxa te dişînin û .. . Kenê Kalemêr gotinên wî dibire.
- Belê, tu diçî û ew pariyeke nan davêjin pêşiya te û çend sêxuran ji min re jî dişînin.
- Na, îro axaftin bi te re zore.
- Çima tu ji rastiyê direvî, ma ne wilo ye. Agob dizane ku rastî di gotina wî de heye, lê naxwezê nas bike. Piştî evqas ked, tuyî dibînî.
- Loma ji wan neke, ew nikarin dev ji karên xwe berdin û bên li ber pozê te rûnin.
- Agobê min, qet di ber dilê min re neçe û neyê; ez ne zarome, piştî evî temenî, yek dikare tayê reş û sipî ji hevdu derîne, bes ji bîr neke ku, çawa seriyê min li keviya îşkê xistin dê rojekê bê û zarên wan jî ê bi lingên wan bigrin û di cihê ku, ez têre xuşandime, ew jî yê bêtin xuşandin.
- Çêtire ku yek bi xortanî ji evê dinê barke. Kalemêr berkenî dibe; ewî naskir ku, Agob bi veşartî dêv davêje pîreka xwe.
- Bes ji bîr neke ku, dar bi berê xwe şêrîn e, lê xûya ye berê me tehle, gereke ji zû de ev dar bihata birîn, lê wer dixûye ku xwediyê wê merivekî bê kêre.
- Te dest bi kifriyan kir.
- Gotinên pir bide aliyekî, tu çi dibêjî ku, em îro bi hev re piyalekê hildin.
- Bes di kalbûna şevê de; tu dizanî ku ez naxwezim cîran ji me aciz bibin.
- Cîran an Marî. Kalemêr dibêje û ji berî ku, ew kenê xwe bi dawî bîne, Agob derdikeve; tu çima çû, çêroka pîrê li dilê te nexweş hat.. ev kuve çû. Lê gava xuşînî ji nav beştên ban tê, bîr dibe ku marê reş di wir de cih girtî, ber bi wir ve dinire dibîne ku, pilindirê wî jî ji nuh ve vegeriye û konkê xwe di quncê berê de ristiye. Radibe û ber bi ewî quncî ve diçe: Tu yî mezin bûyî, di evê windabûnê de te kî daqirtandî.. belê ez dizanim ku, dora min jî nêzîk bûye. Dema bastûn ber bi ewî ve têve dide, ew xwe di nav beştên ban de vedişêre.

**- DAWÎ -**

# ZIMANÊ PÊŞEROJÊ

***ZANA XANÊ***

Zimanê ku îro pir mirov pê dipeyivin, zimanê çînê yê bakur e, lê zimanê herî xurt di dinyayê de zimanê ingilîzî ye.

Berî 15000 sal, hejmara zimanan di dinyayê de, 10000 ziman bûn, îro ew hejmar daketiye tenê 6000 an, jê du hezar ziman li ber mirinê ne, li gora zanyaran 600 ziman tenê karin berdewam bikin.

Pêşketin û xurtbûna zimana girêdayî ye bi xurtbûna miletên ku pê dipeyivin.

Zimanên belavbûyî û serdest di cîhanê de, zimanê wan miletên ku rola wan di abûriya dinyayê de heye, û tevgera wan di rewşa siyasî ya wan deveran de xurt e.

Zimanê ku îro tevgera wî xurt û pirr e, helbet zimanê ingilîzî ye /zimanê dê ye ji 350 melyon beşerî re/ tevî ku zimanê manderînî (çiniya bakur) zimanê dê ye ji 700 melyonî re, nikare wek ingilîzî pêşkeve û belav bibe, di pê re tê zimanê erebî û espanyolî ku her yek ji wan 300 melyon pê dipeyivin.

Li Efrîqyayê zimanê herî belav zimanê ingilîzî û firensî ye, helbet ji ber dirêjbûna dagîrkirina wan ji Efrîqya re.

Rastî û mînakek dîrokî heye dibêje: **di heyamên romaniyan de, gelek miletên kevn abêya latînî bi kartanîn, û bi carekê re ji dev zimanê xwe diqeriyan û bi zimanê romiyan dipeyivîn, da ku xwe nêzîkî empiratorê wan bikin, û xwe di riya wî re biparêzin.**

Zanyar dibêjin ku jiyana her zimanekî li dora hezar salî ye, lê tenê çend ziman di dîrokê de bêtirî du hezar sal jiyane, mîna zimanê misriyanî kevn, zimanê sensekrîtî, çînî, ibrî, igrîkî, latînî, tamîlî..........

Lê bela em zanibin, ku sedemên herî xurt ji bo berdewamkirina zimanekî evin:

1- hestên netewî
2- baweriyên olî
3- kevnetorên gelêrî
4- filoklor û zengînbûna wêjeya devkî
5- xurtbûna abûr û siyaseta miletekî jî, wî ber bi serkêşiya rewşenbîrî ve dighîne û pêre jî zimanê wî xurt dike û didomîne.

Hijmar :
97 û 98
Êlûn û Çireya yekem 2008 z

# DENG

Hijmara (0) di: Tebaxa 1995 ê de derket

Navnîşana internêtê: www.partiya-azadi.net.ms
Rûpela dawiyê
E-mail: rojnameyadeng@yahoo.com

## PEZKÛVIYEK DI DARISTANÊ DE

*Riyad Salih Elhuseyn*

*Wergerandin Bo Kurdî :* Fadil Temo

### HERDEM

Hovekim ez
Ji serdemên kevnar de
Bi penç û qîlan
Ezê bergiriya te bikim
Lawirekî birîndarî
Di daristanekê de me ez
Were û birînên min
Bi serengustên xwe bipelîne
Çîçekeke westa me ez
Di daristaneke dûr de
Bi bêdengî
Ezê pêşve herim û
Li ser sîngê te binivime
Ez peyayekî şaşçûyî me
Va ez destê xwe hildidim
Û lêbûrîna te dixwazim
Ez zarokekim
Waneyên xwe min ezber nekirine
Were min fêr bike
Çawa ez
Pûrteqalekê û heft sêvan
Topî ser hev kim
Rastiyeke tenê li wir heye
Êdî ez têdigihêmiye
Ewe ku evîna min
Di ev zemînî biçûk hilnaye
Ger evîna min balindene bûya
Ma di ezmên hiltên ?
Ger evîna min masî bûya
Ma di deryayê hiltê ?
Ger evîna min darne bûya
Ma di çolên cîhanê hiltên ?
Ez dizanim ku evîn
Sadeye wek laleyan
Hêsane wek baranê biharê
Eşkereye wek ezmanekî şîn
Lê ez dipirsim :
Çira gelek
Ji laleyan
Û ji baranê biharê
Û ji ezmanî şîn ditirsin
Were em
Qeşaya gerdûn
Manî bikin
Bi dînamîta ramûsanan

### JI TE TIKA DIKIM

Tiştekî ji min re binivîsîne
Ji te tika dikim
Bihêle ku
Ez ji te têbigihêm û
Tu ji min têbigihiyî
Bi pênûsekê
Ji min re li ser kaxezkê binivîsîne
Bi engusta xwe li ser lepê min
Bi darikekî şixatê
Li ser boyaxa dîwarekî
Ji min re binivîsîne
Ji te tika dikim
Ji min bibêje ji te tika dikim
Çi sûdeye
Ji xewneke bi tarîtiyê dorpêçkirî
Ji devekî bê lêv
Ji ezmanekî bê şînîtî
Ji daristaneke bê dar
Û ji jiyaneke bê azadî
Tiştekî ji min re bibêje
Ji te tika dikim
Binivîsîne
Yan bikşîne
Yan bistirê
Li ser welatê di'êşiye bistirê

### JIYANA ME YA ÇELENG

Jiyan şirîne
Çivîk dibêje û
Mirî
Li ber solên nêçîrvên dikeve

Jiyan şirîne
Gul dibêje û
Mirî
Di destê lawikê xweşik de dikeve
Jiyan şirîne
Dibêje û
Şeşarê di serê xwe de diçerpîne
Jiyan kirête , geniye , çilqe , şerûde
Zordar dibêje û
Kirtek piskiwît dixwe

### KERASEKÎ ŞÎN

Berî ku
Kerasê xwe yê şîn li xwe ke
Berî ku
Serî li xaltîka xwe xîne
Keçika çeleng mir
Keras hîn di sekreton de ye
Û xaltîk li gundê xwe ye
Û keçik di gorê de ye
De aniha
Çi tişt xewna wê ye
Gora xwe wê
Bi temamî pak kir
Weku gereke
Wê ew çeleng kir
De aniha
Çi tişt xewna wê ye
Piştî ku porê xwe
Bi engustên xwe şe kir
Û nînokên xwe
Bi diranên xwe qut kirin
Xewna wê .. xewna wê
Kerasê wê yê şîne
Û serlêxistina xaltîka wê ye

### RÊ

Di rê de hingê ku ez bi te re me
Di payîza ku dirêj kirî de
Hindê ku roj
Bi awayekî seyr
Bi awayekî dilkêş
Vêdikeve û vedimire
Di rê de , di rê de
Hindê ku peleke darêye zer
Bi ser porê te yê reşî vêketî de dikeve
Ez ji te re dibêjim : Nêzîk were
Balindeyekî zer
Bi ser serê te ket
Û vaye libên nîskê nikil dike
Balindeyekî zerî biçûk
Li ser telên
Porê te yê xoştevî
distriye
Porê te yê ku wek
Keriyek bizin
Li çola dil diçêre

**AZADÎ JI GIRTIYÊN SIYASETVAN Û GIRTIYÊN NIHERÎNÊ RE, DI WELÊT DE**